


ROJA NÛ

kovara hunermendi çandi û edebî



**1
1983**

NAVEROK

Rûpel

Destpêk.....	3
Jî Xwendevanan.....	4
Pîrsa Kurdan Dî Nav Edebiyata Tîrkan da....	5
Hevditîna Du Mamostan.....	9
Himdarê Elfabeya Kurdi, CELADET BEDÎRXAN...	11
Xortêن Tîrk Ber Dadîgeha Dirokê.....	12
Biranina KARL MARKS.....	14
Nigara Jîna Kurd Nava Efrandinêن Wênekêşen Ermeniyanda.....	16
Kîlam û Stranêñ Me.....	18
Kurdzan û Zîmanzanê Jêhati Prof. Çerkez Bakaev.....	20
Çî Dî Vi Dengi da Heye.....	23
Ferhenga Kurdi-Rusi.....	25
Ser Bûyîna Nazîm Hikmet ra 80 Sal Derbaz Bûn.....	27
Zanineha Kurdi lî Parisê Vebû.....	28
Rojnema KURDISTAN.....	29
Fîrnando Wê Rabe Ser Piyan.....	31
Xelatêñ Aşîtiyê.....	32
Diwaneke Nû - HÊVÎ.....	33
Du Filmêñ lî Ser Kurdan.....	34

AGAHDARI

SAL : 5
HEJMAR : 44

Navnişana Roja Nû û Komela me ya nû :
Karlbergsv. 32 B.,nb.
113 27 Stockholm

Xwedi : Komela Karkerêñ Kurdistan
Li Swêd
Berpirsiyar : Rohat
Navnişan : Karlbergsv. 32B. nb
113 27 Stockholm
Telefon : 08-328251
Hesap No : PG. 458980-0

Utgivare : Svensk- Kurdiska
Arbetar Föreningen
Ansvarig Utgivare : Rohat
Adress : Karlbergsv. 32B. nb
113 27 Stockholm
PG. : 458980-0



ROJA NÛ

DESTPÊK

Paşı demeke dırêj, iro ROJA NÛ wek kovareke hunermendi, çandi û edebi dîghêje destê xwendevanên xwe. Hemû rûpelên kovarê, vîr şunda wê bî kurdi çap bîbe. Kovara Roja Nû, ji bo pêştabırına hunermendi, çand û edebiyata kurdi wê bî xwendevanên xwe va tevayı kar bike. Ev yeka pirensipeki bîngehine. Çanda gelê Kurd bî çaveki demokratik, pêşeverû û bi naverokeke ne-tewi (millî) va, wê dî kovarê da bîweşe. Roja Nû, ji aliki da wê dîj zordestiyêن li ser çanda kurdi raweste û ji aliyê din da, ji bo pêştabırına çand, hunermendi û edebiyata kurdi, çi ji destê wê bê, wê bine cih. Ev men zila me daye pêşîya xwe, em bawer dîkin ku, bî piştevaniya xwendevan va dikare bîghêje serfiraziyê. Bo vê yekê deri û rûpelên kovarê, hemû xwendevanan ra vekiriye, ev kovara, kovara wane û pêviste wê biparêzin, bîdîn naskîrin, bifroşin û bî dîl bîbin nûçegihanê (muhabir) wê. Ev dan û stan-dînên navbera kovarê û xwendavan an da, wê tehr û naveroka kovarê hêjatîr bike. Ev yekayê, em bawer dîkin ku, dî zûtirekê, dî warê çanda kurdi da wê valahikê jîji bike.


iro li Kurdistanê û li derwayi welat nêzkaya 20 milyon kurd dîjin. Gelê kurd bî salan, dî nav nezani, belengazi û tariyê da maye. Hêzên kolonyalist hertim gelê me piçûk ditiye, rûmeta gel nîmz kiriye, xwestiye vi gelibike xulam û bo vê yekê bî çavekidilêş va gelê nihêriye. Hêzên kolonyalist disa hertim navê gelê me, welatê me, hebûn wi, zîman, çand û folk-lora gel qedexe kiriye û xwestiye bîheline, ji ortê rake. Lî, dîjmin zû-zû negîstiye armanca xwe, carîna dî nivê rê da maye. Ji ber ku jiyin bî xwe dîkele, dîherike, dîguhire, carîna mercen der-hundur dîghijine hev bû yerên nû nîşkêva peyda dîbin û planên dîjmin dîkevinê avê. İro hin kes he-ne dîbêjin heta welatê me azad û rîzgar nebe, dî nav vê rewşa kolonyalist da mîrov nîkare çanda xwe pêsta bîbe, bo vê ji ev kesana karêñ li ser çan-da netewi piçûk dîbinin û bî destgîrêdayi benda rojêna zâdiyê dîsekînin. Ev baweriyêñ nihîlist, tûj û xelet, tenê kêri dîjmin têñ. İro li dînyayê karêñ informasyon û kontakten gihiştîye dereceke mezîn. Dî demeke vi tehri da, jiyin bî xwe van baweriyêñ çewt, pûç dîke. Bî kurti, em dîkarîn bêjîn dî tekoşina rîzgariya netewi da karêñ hunermendi, çandi û edebi roleke me-zîn dilizîn.

Redaksiyona Roja Nu wê van hemû hewcedaryan bîde ber çavêñ xwe û wê kovareke baştı̄r bîghîne destê xwendevanan.

Bî Silavêñ Germin

Redaksiyona Roja Nû

Jİ XWENDE VANAN



Gulistana Kurdistanê çavê xwe bî xaliya agirê dîjmin va kîldaye, her derê ciwan û ges dibe. Ev şevitan-dîn û qırkırina şîtlîn teze, ev hovi tiya dîjmin, dî nav bîstanêñ rû bîken da, zeviyê me bî hêzdike. Dar û kullilkêñ me namîrin, heya dengê giyanê mîrxasêñ derkeve. Em jî metodêñ rassit û faşist natîrsin. Eger iro heval-hogîrêñ me giyanê xwe diyar bîkin, piştî çendeki mîrxasêñ dîn wê serê xwe rakîn û wê bî xurti hêzên xwe binin ser hev.

Ez zanim heta şer lî cihanê hebe doza aşitiyê nikare serkeve.

Kurdistan namire, baweriya me bî serketîna milletêñ bîndest tê. Rewşa me diguhire, pêştadiçe, bî destê xebata mîr û jînan bî hevra.

Jînêñ me, jînê Kurd destê xwe ne dane hev. Ev yeka zîrareke mezîn dîg hine doza gelê Kurdan. Lî, ew gav bî gav xwe davêjîne nav agirê şoressê. Jî ber vê yekê em dikarin bêjin ku keçen Kurd piştgirtiya mîran dîkin.

Xuška Kurd ! liber her çar perçen Kurdistanê destê xwe bîdin bîrâyêñ xwe û pêsiya lî dîjmin bîgrin, guh nedîn mîrovêñ nezan, guh nedîn paşverûyan, axan, began û ramanêñ burjuvaziyê. Pir jînêñ Kurd, dî roja iroyin da eniya xwe dane ber top tîvingêñ dîjmin, dî nav çiyan da alikariya pêşmergeyan dîkin.

Lî herçar beşen Kurdistanê da ji, tu wekhevîk tuneye. Jî ber vê yekê keçen Kurd pêwîstîn hîşyar bîbin û dîlê wan bî agirê azadiyê va bisewite.

Îro keça Kurd bî hîşki lî ser pîrsa netewi dîsekîne û lî dîji sistemkariya dîjminê xwinxar kar dîke, jî bo pêşketîn, tevgera azadixwa zîn Kurdistanê lî hemû cihanê şer dîke. Jî aliyê din, bona perwerdeki

rîna zarokêñ Kurd û bona fîrkîrinê, jîn hêzên xwe tînin ser hev, wek ma mosteyan dixebeitin.

Em jînêñ Kurdistanê, pêwîste bangî hev bîkin û xwe bîghinîn hev.

Çîma baxêñ me talan bûne, jî bo çî zarokêñ me birçine, çiye ev nali na zarokan, kal-piran, guh bîdîn dengê wan. Jî bo çî, em bê mal, rûtazi mane.

Keçen Kurdistanê rakîn ala aza-diyê û aşitiyê. Jî dîjminêñ çav bî sor û jî gurêñ dev bî xwin netîrsin, bî zaneti-serwexti rîça xwe ronahi bîkin, zarokêñ xwe bî giyanê (ruh) welatpareziyê mezîn bîkin û giyanê internasyonali, têxîn nav canê wan. Wan bî hezkirineke bîrati va bîghinîn.

Nalina Kurdistanê hertim tê guhê me

Em keçen Kurdistanê, pêvîste tu wext berpîrsiyariya xwe bir nekin û guh bîdîn dengê gelê Kurd.

Viyan
Jî EFRÎNÊ

Jî berpîrsiyaren ROJA NÛ'ra

Beri her tîsti gelek silavêñ şoressgeri û niştîmani ez pêşkêsi we hemû hevalan dîkim. Zor spas jî bo karen we. Ez jî wera hertim pêşketîn û serifîraziyê dixwazim.

Birayêñ hêja, ez bî xwe kurdeki, jî Kurdistanâ Suriyême, ez lî Romanya û dixwinim. Ez, jî bo fîrkîrinâ zimanê kurdi hin kesan ra, kovereke bî navê "Duwaroj" her meh derdixim, ew bî zimanê kurdi çap dibe. Çawa tê zanin hin xwendevanêñ me hene, bî xwendin û nîvisandîna kurdi da, şûnda mane jî ber vê yekê, min ev kara pêvist dit.

Jî aliyê din, ez carna helbestân jî dînîvisim, hîndîk maye pîrtûkekê çap dîkim.

Dumahikê'da, ez careke din, we spas dîkim

Hoşiyar
ROMANYA

"PIRSA KURDAN"

Dİ NAV EDEBIYATA TIRKAN DA

ROHAT

Gelên Kurd û Türk lı rohilata nê zik da, bı salan cinarti hevra kırne, nasiya xwe dane hev û di navbera van herdu gelên rohilatê da bı hezaran kontak-peywendiyêن cure - cure pêk hatine. Ne tenê gelên Kurd û Türk, em dîkarin bêjin hemû gelên ci hanê dîkarin di nav xweşiyê da bimîn, hevra bijin û di nav xwe da dos tanetike germin bajon. Lî, kevneperest, paşverû û burjuvazi vê yekê tucar naxwaze. Ew dixwazin hertim gelan beri hevdin û wan bı destê hev bîdin qırkırin. Vê yekê zirareke mezin gihandiye dostanetiya di navbera gelan. Carina hîn kesen nezan, belen gaz û şirhelal ji di bin idolojiyê burjuvaziyê da mane. Şovenizm, nijad peresti û dîlêsi di navbera wan da ji tuj bûye, carina ji ew bûne berdevk-xulamên burjuvaziya xwe.

Lî Tirkiyê, di navbera ronakbir, zane, pispor û niviskarêن Tirkan da, vê idolojiyê li ser wan tesireke mezin hiştîye. Wan carina bı çavên burjuvaziyê va problem, bûyer û li jiyinê nihêrine. Paşı avakırına komara Tirkiyê, di sala 1923'an da idolojiya Kemalist demeke dîrêj, bûye idolojiya burjuvaziyê û xurt maye.

Şkandına tesira vê idolojiya kevneperest li Tirkiyê hêsa nebûye û heta sala 1960' an ajotkiye. Paşı van salan li Tirkiyê rûmeta idolojiya Kemal Ataturk perçeki nîmz bû û bir-baweriyêن şoreşgeri bejn dan. Lî, tesira kemalizmê, idolojiya burjuvaziya piçûk û bir-baweriyêن şovenist di nav şorîşvanêن Türk da ajot, hat gihişte van rojêن iroyin û ji bin va ortê ranebûn.

Di nav vê rewşê da, pîrsa tekoşina azadiya Kurdistanê, rewşa Kurd û problemen vi geli ji baş ji hev ne hatin deraranin (analiz nebûn). Zor

destiyêñ li ser gelê Kurd bı politik nehatin ditin û di nav rewşa Tirkiyê da vê yekê li ser edebiyata Tirkan ji tesirek hişt.

Di nav edebiyata Tirkan da, çawa em lê dînhêrin rewşa Kurdistanê, pîrsen Kurdistan, jiyina li vi welati û li ser mîrovêن Kurdistanê pîr kêm tîst hatine nîvisandinê, hîne tîst xelet hatine nişandinê, an ji çend nîviskarêن Türk hîne pîrsen berbiçav vaji û sero-bino kîrine. Çend nîviskarêن Türk ji, pîrsa Kurdistan sergirti (vesarti) di nav efrandinê xwe da nitîrandine. Ev ji, tîrsa nîviskarêن Türk nişani me dide.

Ji aliyê dîn da, em dînhêrin paşı sala 1970' an li Tirkiyê hîndik tîst hene, xweş hatine nîvisandin, rasti pîrin û direk, raste-rast li ser rewşa Kurdistan hatine nîvisandin. Hîne nîviskar ji hene ber ra derbaz bûne û nexwestine zêde problemê ve-kolinin û navê Kurdistan bîdin. Bî kurti, em dîkarin bêjin edebiyata Tirkan, li ser rewşa Kurdistanê, di navbera du avan da maye, zêde rê hilnedaye. Ev ji, ji bo têgihiştina edebiyateke realist kîmasike û iro ji ev kîması li ber edebiyata Tîrki sekiniye. Edebiyateke realist û nîviskareki demokrat pêviste kîrasê li rûye rastiye bîkşine, xwe bîghine kûraya problemê.

Di edebiyata Tirkan da, efrandin li ser tevger, berxwedan û serhîdanêن Kurdistan (di dema Ataturk da) hatine nîvisandin, bî xeletiyêñ mezin va tijine. Bî çaveki baş û rast va bîngehêñ wê demê bî bawerike şoreşvani va nehatine vekolandin. Gire gir û siyasetvanêن burjuvaziya mezin çi gotina, carina wan ev yekana duçar kîrine. Di vê babetê da bî taybe ti romanen 'CEMO û MEMO' li Tirkiyê

nav û dengin (1). Niviskarê van romanen Kemal Bilbaşar çawa tê zanîn beri çend rojan çû ser heqîya xwe.

Bî rasti bûyerên van herdu romanen xurt bî hevra gîrêdayine û paşî serhildana Şêyx Seyit (1925) lî Kurdistanê rewşa Kurdistanê dîdîn berçavan.

Dî romana pêşin-Cemo'da niviskar bî çaveki nebaş va bûyeran dînhîre, zordestiyêni lî ser gelê Kurd qet nabîne, jî aliyê din berxwedana : gelê Kurd puç û kareki şaş dibine. Jî ber vê yekê, niviskar dî 'Cemo' da lî ser Kurdê bêbext-xayîn (Şeyx Mahmud) dî sekîne. Nokerti û xayıntiya wi bî çâvîn niviskar tiştîki pozitîfe û serbazên Tîrkan ji di romanê da, rûmetawan jî aliyê niviskar da hatîye bîlîndkîrin. Mesela, dî besêke 'Cemo' da jî van serbazan yek vi tehri deng dîke: "-Ez kîrim dîjmînê Zazayan, ez jî vîra dûrxistim, hûn vê yekê bîzan bin. Hukmetê rewşa xwe guhîrandiye, bî Zazan va kîfxwêş dîbe û lî rûye wan dikene. Eva rîke pîr xelete. Serê me belakê wê vebe, hunê bibinîn. Bê şik ev belayê jî aliyê Zazan da wê bê. Lî bal ma metelokek heye: Alu çâ nexe baxçê xwe û yoruka ji nexe mala xwa. Lî vir ji, pêvîste mîrov bêje; tutu nexe baxçê xwe, Kurdan ji nexe mala xwe. Em zarbûn, me nîzanbû, berda, niha ji em cezayê xwe dibi-nîn. (Rûpel 61 -Cemo). Dî vê çarçevê da, nîvisandîna vê romanê, gaveke paşe, jî bo edebiyata Tîrkan. Lî, qencî ke vê romanê ji heye, ew ji, nîviskar bî jêhati folklorâ Kurdan, navê wan, jîyîna wan, bî zimaneki pîr xweş va nîvisandiya. Bedewiya zimanê Tîrki, bî rasti 'Memo û Cemo' da xwe pîr baş diyar dîke.

Bî jîhevderanina bûyerên 'Cemo' va Kemal Bilbaşar dîce dîghêje, nîviskarê romana 'DERSIM -1938'e Barba ros Baykara. Çawa tê zanîn, Barbaros Baykara serhildana Dersimê da kuştîna bî sed hezaran gundiyêbelangaz nade ber çavê xwe, tenê xêra çend burjuvaziyan dîparêze.

Dî rojnama bî navê ASYA'da Demirtaş Ceyhun, paşî serhildana Şêyx Seyid tablokê lî ber çavê me radixe (2). Mîrxasê romanê Abuzer laweki Kurde û bavê wi dî şerda tê kuştînê.

ew bî xwe sêwi (êtîm) dîmine. Paşî saline dîrêj Abuzer mezîn dîbe û demekê hêzîn hukmetê tê malêwan hil weşînin, jî ber ku ev mal bê destûr hatîne avakîrin. Abuzer bî kesen dorberê xwe va lî dîji polêsan şer dîkin, radiwestin. Bî kurti bî çaveki soreşvani va rûmeta mîrxasê romanê Abuzerê Kurd pîr bîlinde.

Dî nav edebiyata Tîrkan da, mîrov dîkare bêje niviskar Ömer Polat rîçekî nû vekir û dî romanen xwe da raste-rast lî ser rewşa Kurdan sekîni. Jî aliyê zîmin, edebiyat â jî aliyê jîhevderanina bûyeran da Ömer Polat bî jêhati kar kiriye. Jî ber vê yekê romanen wi, hêjayî çend xelatê hunermendiyê bûne (3). Bî taybeti romana 'SARAGÖL' da, dostanetiya navbera gelên Kurd û Ermeni bî zareki xweş va, Ömer Polat raxistiye ber çavân. Disa listika wiye bî navê Miheyê Aladaxê ji lî Tîrkiyê naveki hêja stend. Niviskar niha ji lî ser berxwedana Çiyayê Gîridaxê romanekê dînivise. 'Mahmudo û Xezal', 'Saragöl' û romana 'Dilan'ê da mîrovên Kurdistanê bî rasti bî rûmetin, mîrxasîn û şîrhehalîn.

Dî romana Yilmaz Güney'da, lawê Kurd Xelil ji bajarê Siverekê, bî dîya xwe va bar dîke, dîce bajarê Ede-nê. Paşî xulamti, olamti û berdestike dîrêj, ew hîne tiştan fem dîke û hîşyar dîbe. Belangazi, zelali û xizaniya Xelil dî romanê da pîrseke se rekeye (4).

Wek romana Yilmaz Guney 'BOYNU BÜKÜK ÖLDÜLER' (Dî nav belengaziyê da mirin) vê carê ji Yusuf Ziya Bahâ dînli dî romana xweye 'GEMİLERİ YAKMAK', da lî ser mîrxasê taxa Kurdan MEMO dîsekîne (5). Memo laweki Kurde dî nav bîlîndbûna karê politik da cih dîgre, lî bajarê Entepê dîji kev neperastan şer dîke û dî dawiyê dâ jî aliyê noker û xulamokeki kevneperest tê kuştînê. Dî despêka romanê da niviskar camêriya Kurdan dî nav çar xetan da, xweş diyar dîke:

De bêjîn dayika min,

bîra çîrê vînexe

Bîra doxina şala xwe berde,

lînexe

Bîra dernekeve,

lı serê rê-dirban
 ji bo kurê xwe.
 De, lêxîn lavê kurdan roj roja
 xiret û namûsêye.

Yaşar Kemal raste-rast navê Kurdan, rewşa wan, hîne pîrsên politik bî fîreti, dî efrandinê xwe da, mîrov nîkare bêje nîtirandiye. Hemû tîstêni bî Kurdan va gîrêdayi sergîrti (veşarti) mane dî nav efrandinê wi da. Lî, car-carina ji navê Kurdan direkt daye, ew dane nas kîrin û mîrov têdîghê weki ew Kurdin. Yaşar Kemal, ji aliyê dîn xwe nedaye lî ber hîne pîrsên politik-diroki lî Kurdis tanê û ew venekolandine, serê xwe pîra ne êşandiye.

Yaşar Kemal bî xwe Kurde û Kurdistanê ji baş nas dike. Lî Kurdistanê ser rîwitiyênxwe ji wek tê zanin, pîrtûkeke gerê û roportajan nîvisiye (6). Qelema Yaşar Kemal bî rasti xurt û tüje. Ew ne tenê lî Tîrkiyê, lî hemû cihanê iro baş hatiye nas kîrin.

Niviskar dî despêkêda, çirokeke pîr kevnare, bî zareki folklorik, mitolojik û xweş va nîvisi, ev çiroka dî dema Mahmut Xan da, hevhezkırına du dîlketiyan Ahmet û Gulbaharê tîne ber çavên me. Ev çiroka bî navê 'Ef-sana Çiyayê Gîridaxê'(7), çawa tûrko logen Sovyet diyar dikin, bî xwe ev çirok lî Kurdistanê derbaz bûye (8).

Dî nav serpêhati (hîkyat) û romanen Yaşar Kemal da em dibinin, carîna pîr tîstêni hîndîk û rîndîk hatîne nîvisandîn, Mesele, dî serpêhatike xweye dîrêj da (9), şin-gîriyê jînêni Kurd me ra diyar dike: "...Kurdan hemûyan bî dengêk û deveki dest bî şin-gîrike dîrêj kîrin û pîr dîrêj, dema wana dest bî gîri kîrin, kaş, kendal û zînarêni wê hîlê hejiyan û carîke dîn hatîn şuna xwe. Şin-gîriyê Kurdan, bî tîrs wek dengê mîrinê, wek dengê hîviki, an ji wek qîrina wundakîrinê, lî serê zozanîn dîgeriya. Mîrovênu dema ev şin-gîri bîhistin, carke dîn nikaribûn ev deng ji guhêwan kîmbin. Her tîst bêdeng ma, xelas bû, xîn ji vê qîrin-qîjina, mîrova bawer ne dîkir, get tîstek ne ma". Çawa xweş diyar dîbe, Yaşar Kemal xeysef, kevneşopi

û edetêni Kurdan baş nas dike.

Disa ew dî keriki romana "Erd Hesîn, Ezman Sîfar" (10) lî ser jîrbûn, jîhatibûn û dengê sazbendê Kurd Evdalê Zeynikê dîsekine, wi ji mera bî zareki xweş va dîde naskîrin: "Cameyeji lî ra dîbêjîn Evdalê Zeynikê. Bi herdu gavan va nabine û ew bengine. Ew ji çiya, zinar, kur û çi vikanra stranan dîbêje. Ew ji dengbêjîn dîn neçûye. Ew ji sîbê heta êvarê, ji êvarê heta sîbê distirê, nasekîne. Çawa avek dîkîse, nasekîne, westan çûye nîzane, gili-gotinê Evdalê Zeynikê ji nayêni birin. Di rîda, newal, darîstan, lî ser zînar, lî her cih, nasekîne, dîbêje. Dema mîrov lî dor wi tunebin, ji avê ra, kulikân ra, muri, boxok, lî dînyayê çi mexluget hebe û çi bê ber wi, lî ser wan dîbêje ew...". Yaşar Kemal dema lî ser Evdalê Zeynikê deng dike, wi bî dengbêjê Kurd nav dike.

Di nav hîn nîviskarîn romanen da em dibinin ku, ew ji, dî efrandinê xwe da cîheki fîreh dana pîrsa Kurdan. Di nav van da karêni Seyit Alp barbîçavîn (11). Wi taybeti dî romana dawin ya bî navê 'DîNO û CEREN' da bî tehreki tenik xweşik û jehati, hîn xeyset û folklorâ Kurdi, dî romana xwe da nîtirandiye. Di romana 'WELAT' da ji, wi, serpêhatiye Kurdi ku, ji welatê xwe bî darê zarê va hatîne dûrxistin, dî efrandinâ xwe da nîtirandiye.

Lî Tîrkiyê bî taybeti gelek nîviskaran bî Kurdan va gîrêdayi pîr serpêhatiyê delal û qenc nîvisandin. Di nav van serpêhatiyan (hîkyat çirok) da, debara Kurdan, rewşa cîvakî-diroki lî Kurdistanê, hîn bûyeren Kurd, hîn xeysedîn jîyinê di nav Kurdan da û bîlîndbûna şerê politik çawa lî seranseri Kurdistanê gîrt, wek van pîrsan gelek pîrsen dîn ji bûn naveroka van efrandinan.

Di vi wari da Bekir Yıldız gavîne pîr serfiraz û pêşketi avit. Wi ji hev xwestir pîr serpêhatiyê nûjen (modern) lî ser rewşa Kurdan nîvisi û bû nîviskareki navdar, bijarte. Wi bî her aliyan va, Kurdistanâ iroyin, jîyinâ mîrovêni Kurd peywendi yêni wan bî hevra, bî teybeti va û dâ

xwazêñ mîrovêñ me ani lî ser zar-ziman. (12)

Bekir Yıldız bî taybeti lî ser hêla bajarê Urfayê, Entepê û Merdi-nê nîvisi, bî xwe ji lî Urfayê hate dînyayê. Ji ber hêjaya serpêhatiyêñ xwe, gelek ji xelatêñ edebiyat û hunermandiyê girt, wek xelata bî navê Sait Faik... Dî pirtuka xwe ya bî na vê 'REŞO AXA' da, ew bî rasti peywen di, kontak û jiyina sosiyal lî Kur-distanê tine lî ber çavêñ me radixe. Dî despêka vê pirtuka xweşik da dî-nivise: "Mirovêñ rohilatê-Kurdistan ji bo dîlketiyêñ xwe, bo daxwazêñ xwe dîmrin û ji bo bijin, lî dînyayê bîminin, dîkujin". Ev giliyêñ kurt û menekûr, bî rasti filozofiya jiyi-na Kurdan pîr xweş diyari me dike.

Dî warê serpêhatiyan da Osman Şahin lî ser hêla çemê firatê (13), Dursun Akçam lî ser hêla Qersê (14) û Ahmet Say ji lî ser hêla Bingolê (15), serpêhatiyêñ cure-cure nivi-sin. Disa Esma Ocak lî ser rewşa ji-nêñ Kurdistanê serpêhatiyêñ hêja nî-visin (16).

Pîr salan edebiyata lî ser Kur-dan, dî edebiyata Tîrkan da bî navê "Edebiyata Rohilatê" û "Edebiyata Gundan" cih girt. Hemû pîrs û babe-têñ dî nav vê edebiyatê da cih gîrtin ji, bî navê "Pîrsêñ Rohilatê" ha-tin naskîrin. Bî tîrsana gelek nîvis-karan nexwestine bî vê pîrsê va (pîr sa Kurdistan) serê xwe têxîn belayê, ji ber vê yekê ji, bî tehreki sergîrti (veşartî) va xwestine ser Kurdan bîsekînin, Tu wext rê neketiye ber nîviskarêñ Tîrk, weki bî xweşî û bî daxwaziya dîlê xwe karêñ xwe bajon. Vê yekê mîrov dîkare bî du faktoran va şiroveke:

- Zordestiyêñ lî ser karêñ çand, hunermandi û edebiyatê.

- Kêmasiyêñ politik lî ser pîrsa Kurdan, piçuk ditîna gelê Kurd bî destê nîviskaran û jihevderanîn. (analiz) nebaş lî ser rewşa Kurdistanê.

Bî kurtebiri dema ev herdu faktor rên jorin dîghêjîne hev, şasi, xele-ti û kêmasi hîn ji kûr dibin. Nîvis-karê Tîrk İsmayîl Bêşikçi bî lêgerin vekolin û xebatêñ xwe va bî rasti, pîr alikariya danaskırına Kurdan kîr

û dî cida dest da ser pîroblamê. (16) Lî mixabîn, nîviskarêñ dîn hîn ji hê xwe negihandîne dereca vi camêri, e-ve, serêsi û jana edebiyata Tîrkan.

- 1 - CEMO, Kemal Bilbaşar - 1966
- 2 - ASYA, Demirtaş Ceyhun - 1970
- 3 - MAHMUDO ile HAZEL (1973), SARA-GÖL (1974), DİLAN (1976), Ömer Polat
- 4 - BOYNU BÜKÜK ÖLDÜLER, Yılmaz Güney - 1971
- 5 - GEMİLERİ YAKMAK, Yusuf Ziya Bahadînlî - 1976
- 6 - BU DİYAR BAŞTAN BAŞA, Yaşar Kemal - 1979
- 7 - AGRI DAĞI EFSANESİ, Yaşar Kemal 1970
- 8 - SOVYET TÜRKOLOGLARININ TÜRK EDEBİYATI İNCELEMELERİ - Cem Yayınları - 1980
- 9 - BİLYA - Yaşar Kemal'in uzun öykü sü - Sanat Dergisi - 1980
- 10- YER DEMİR GÖK BAKIR - Yaşar Kemal - 1963
- 11- WELAT - Bir İsyancının Türküsü - Seyit Alp - 1978
DİNO ile CEREN - Seyit Alp 1981
- 12- REŞO AĞA - Bekir Yıldız - 1968
KAÇAKÇI ŞAHAN - Bekir Yıldız 1970
HARRAN - Bekir Yıldız - 1972
- 13- KIRMIZI YEL - Osman Şahin 1971
- 14- ANALAR ve ÇOCUKLAR - Dursun Akçam 1964
- 15- BİNGÖL HİKAYELERİ - Ahmet Say 1981
- 16- BERDAL - Esma Ocak - 1981
KIRKLARDAGI'NIN DÜZÜ - Esma Ocak 1982
17. TÜRK TARİH TEZİ VE KÜRT SORUNU
İsmail Beşikçi - 1977



HEVDİTINA DU MAMOSTAN



Welatê me Kurdistan, ji aliyê dewletên kolonyalist û kevneperest da hatiye perçekirinê. Zordaran gelê me, ji hev dûr xistîne, bî hemû qewetê xwe li ber pêşveçûna zimanê me, çanda me, aboriya me, rawestiyane. Nahêlin zaroyê me, bî zimanê dayka xwe bixwinin, bî hebûna xwe behêsin. Her ki ku dî riya azadiya milet û welêt da rabûne, êrişke mezin birine ser wana. Xwestîne ku miletê Kurd dî tarixê da wunda bîkin.

Lê, tarixê isbat kiriye ku, qet qewetek nikare daxwaza azadi ya geleki bîndest bifetisine.

Îro, daxwaza azadiya gelê me xurttir dibe. Şayirên wek Cigerxwin, daxwaza gelê meyê bîndest av dane, ew her ges kîrine.

Dî wextênu ku parti û sazmanen geleri dî nav miletê Kurd da ne xurt bûn ji, şayirê mezin Cigerxwin kiriye qîrin û hewar, rîst nî visine, li nav gel belav kîrine, Gel rewşa xwe dî rîstênu Cigerxwin da ditîye. Zordariya ku axa û began, şêx û melan li ser gel ajotîne, dî rîstênu Cigerxwin da xweş hatîne ber çavan.

Bê şik, mîletek beri her tîsti bî zimanê xwe va heye. Meriv, nikare meleteki bêziman bîfikire.

Zanayê mezin Qanatê Kurdo, xebata ku dî vi waride hatiye kîrînê, bî pêşda bîriye. Destûra zimanê me, ferhenga zimanê me nîvisîye, bî mîletîn cihanê nişan daye, ku zimanê Kurdi zimaneki serbi-xweye, ne (weki tîrk dibêjin) zimaneki ku, ji 32 pêyvokan pêk hatiye.

Dîvê, meriv bir neke, ku mîletêki bîdest ne tenê bî çeka şerê azadi dide. Her wusa ji, dî warê ziman, edebiyat û çand da şer dike, ziman, edebiyat û çanda xwe pêşve dibe û xirabiyênu ku kolonyalistan kırine paqîj dike û bo yekbûna mîlet dixebite.

Hêzên kolonyalist, hevalbendêne wan kevneperastan hertim êrişê ke mezin birine ser birewerêne mîletêne bîdest, bo ku mîlet şiyar nekin, riya azadiyê nişani mîlet nedîn. Em dîkarin navê gelek zana û birewerêne Kurd bijmîrîn ku ew êrişen bî xof dîtine. Qanatê Kurdo û ên mayin. Ew hemû ji dî hundîrê şerê Cihanê Yekemde ji ci û warê xwe hatine dûrxistinê. Bext lî hînekan xistiye, hatine welatê Lînenê mezin, Yekitiya Sovyetistana Sosyalist. Lî, bext lî hînakan ji nexistiye, ji bin destê zordareki reviyan, hatine keti ne bin destê zordareki dînê.

Qanatê Kurdo 10 sali bî dê û bavê xwe va tê Sovyetistanê, lî wîr xwandîna xwe xelas dike. Emrê wi iro 75 saliye. Dî hemû emrê xwe da wi bo mîletê xwe, bo welatê Sovyetistanê bê westan kar kîriye. Qanatê Kurdo niha lî bajarê Leningradê Akademiya Zanistiya Sovyetistanê da, dî beşê Kurdi da seroke. Wi dereca doktora ulmi standiye û proffesore.

Lî, weki ku me got, kolonyalistan tu car tahmul nekîrine ku şayir û hozanêne me bî zimanê Kurdi binivisin, rîstêne xwe dî nav gelde belav bîkin. Cigerxwin gelek teda dîtiye, bo wi bî zimanê karker û cotkaran kîriye qêrin û hawar. Kevneperestan nehiştine ew diwanêne xwe serbest çapbike. Ewi çend diwan bî dîzi çapkırıbu. Lî, gelek xebatêne wi yêngapnekiri hene.

Her wûsa ji, hovitîyêne dîjmîn imkan nedane ku zana û hozanêne Kurd bêne cem hevdu, hevdu bibinin. Wana nav û dengêne hevdû bîhishtine, xebatêne hevdu naskîrine, lê bê ku hevdu bibinin cûne heqîya xwe.

Sala 1979'an Cigerxwin hatîbû Swêd û hê ji lî Swêd dîji. Ew lî vîra dîkare bî serbesti binivise û xabatêne xwe çap bike. Lî cihanê bigere, mîletêne cihanê nasbike.

Payiza 1982'a Cigerxwin çû Leningradê, Dî jiyana wi da daxwazêke wi ji, bî ci hat. Weki welatê Lînenê mezin dit û lî cem hemde mî xwe zanayê mezin Qanatê Kurdo rûnişt. Ew roja bû şahiyeke mezin. Xwendewanêne Kurd lî bajarê Leningradê bo hatîna seydayê mezin Cigerxwin şevez çekir. Dî wê şevê da gelek zana û xwendewanêne Kurd ji beşdar bûn.

Em bî hevditina du mamostan pîr şabûn û mîrov nikare wê rojê zû-zû bir bike.

SERHAT



himdarê elfabeya

kurdî:

CELADET BEDIRXAN

Di nav pîspor, zane û ronakpirê kurd da navê Celadet Bedirxan ciheki bî taybeti digre, ji ber ku, ew himdarê elfabeya kurdiye li ser bingehêñ elfabaya latini. Ji aliyê din, wi himêñ zimanê edebi (nîvisari, literaturi) avitiye û di warê pêştabırına zimanê kurdi roleke aktif listiye. Çawa tê zanin, nîvisandina zimanê kurdi bî tipêñ(herfêñ) latini va hev tê, hêsaye û rêke raste.

Malbata Bedirxanan li Kurdistanê pîr tê naskırın û iro pêştaçûyina zimanê kurdi bî tipêñ latini va, ji ali ki da mirov dîkare bêje bî karêñ vê malbatê va girêdaye. Celadet Bedirxan û herdu bîrâyên wi -Kamuran û Suriye Bedirxan, di vê rê da karkirine û keda wan pîr derbaz bûye.

Celadet Bedirxan di sala 1897'an da lî bajarê Istenbolê ji diya xwe bûye. Lî Tîriyê paşı xwendîna pêşin û navin ji ber gelek dijwari, zordes tiyan, ew mecbûr ma, çû, bajarê Bakûyê paşê ji çû derkete bajarê Berlinê, weki li wir xwendîna bîlind bîqedine.

Demekê şûnda Celadet Bedirxan, ji Elmanyê vedigere, tê Kurdistanê û lî bajarê Şamê destpêdike Kovara HAWAR' ê bî zimanê kurdi û fransi bî hevra derdixe. Celadet Bedirxan bî xwe ji dîbe berpîrsîyar û xudanê kovarê. Li dora vê kovarê, gelek nîviskar, helbestvan, zane û ronakbirêñ kurd berrev dîbin, wek Cigerxwin, Osman Sebri û her weki din... Kovara HAWAR di

navbera salêñ 1932-1943'an da çap di be û 57 hejmarê wê derdikevin.

Di nav rûpelêñ kovarê da, pelêñ zimanê kurdi, beşen folklorê, wek weşandîna destana Mem û Zin, gelek hel best, deng û behsêñ cihanê, bi taybeti lî ser şerê cihanêyi duwemin, ciòrok û gelek tîst ji bî zimanê frensi hatin çapkirin.

Celadet Bedirxan keseki pîspor, zane û ronakbireki têgihiştî bû, rewşa Kurdistanê, navçê û lî ser rewşa cihanê haj pîr tîstan hebû. Mirov dîkare bêje, kesen wek wi, di wê demê



da pîr kêm bûn. Ew rêber, serwêr û mamosteki serwext bû. Jîna (Pirek) wi Rewşan Bedirxan ji, bî giyanê (ruh) welatparêziyê va tiji bû û gelek ali kariya wi dîkir. Ji bo hisyarbûna ge 1ê Kurd û ji bo ortêhilanîna nezaniya di nav kurdan da, bî rasti kar û barêñ Celadet Bedirxan pîr hêja bûn. Ji aliyê din, ji bo şkandîna zor destiya politik lî ser gelê kurd, Celadet Bedirxan, hertim xwe davite nav êgir û nefereki mezîn bû. Camêri, serwexti û mîrxasiya wi, iro di dilê gelê kurd da ciheki pîr germ girtiye û ew di bira gelda dîmine.

Celadet Bedirxan, di sala 1951' an da çû ser heqîya xwe û bû keseki dilovan.

"Xortê Tîrk Ber Dadigeha Dirokê"

TOSINÊ REŞİT

Zanyarê Ermenistana Sovyetê dereca lêgerin û ronikirina mêtjûya (diroka, tarixa) gelê xwe û gelê cinar kareki mezin dîkin. Ji ber ku bî sedsalya çarenûsa pareke ermenya mêtjûya dewleta tîr-kara gîrêday bûye, ewana guhdarike mezin dîdne ser mêtjû ya tîrka û bî taybeti ser wan pîrsa, yê ku derheqa pevgirêdanê dewletê tev gelê bindestin. Wê derecêda lêgerineke berbiçeve kitêba wezirê (ministrê) Komera Ermenistanêyi karê der, doktorê zanyaryê, profêstor Con KIRAKOSYANE " XORTÊ TÎRK BER DADGEHA MËJÛ ", ya ku isal bî zimanê ermeni li Erêvanê çap bû. Kitêba çapbûyi para lêgerinê ye pêşine, ya ku ji salê 1890'i heta 1914'a hîltine nav xwe.

Pêşgotina kitêbêda xudanê wê dînivise, weki adara sala 1981'ê li Stanbûlê bî siyaneta leşkeri û dewleti, bî heyteholeke mezin 60' salya kuştina Talyatê merîvkuj hate kîvşkirinê . Serokê Tîrkiyayê rojêne me, ku diji têrorizmê gotina dîkin, serê xwê bér bîrâ-nina têrorist û merîvkujê mezin xar kîrin. Disa despêka sala par li Ankarayê forûma zanyaryêda dîhate makkirinê, weki Kemal Ataturk diji sosyalizmê bûye, weki alikarya welatê cinari mezin şer-karya tîrkaye azadaryêda diweriminin.

Tîrkiya iroyin da weke hîv qedrê Talyat, Ataturk û Ebdul Hêmî dê duda dîgrin, bona serokê Tîrkiyaye hemû dema bûye xeyset her pêkhatîneke mêtjû bî têza diji ûrîsa, diji Sovyetê û diji komûnista kar binin. Lema ji rast ronikirina mêtjû û rexnekirina mêtjûnûsê Tîrkiyaye nijadperest, ew xebate diji dîjmîn û neyarê komûnizmê.

Propoganda Tîrkiyayê ne tenê ji gelê xwe rastiyê vedîşêre. Lê roj bî roj bî vîrû derewa serê gelê xwe tîji dîke, wana bî giyana dîjmîntayê berbi gelê ne tîrk terbet dîke. Heta iro ji, hebûna gelê kurd bî dewleti tê nanakîrin, xwexwetya wê, mafê wêyi xweçare-nûsiyê nayê naskîrin. Van demê, paşin wezirê berê Şerefedin Elçi 2 sal 3 manga ceza kişand tenê bona wê yekê, weki got : "Ez kurdim, Tîrkiyayêda kurd hene". Ew nava propoganda kurdityê û sêpara-tizmêda tawandar kîrin. Bî navê şerkarya diji têrorizmê tadeyekî nedîti tîne serê gelê kurd, bî hezara dukujin û davêjine girtihan.

Bî navê diji têroristiyê li Tîrkiyayê iro azayê lape bîçûk tê ne hîncîrandinê, parlamentari hatye pêpeskîrinê. Diktatorya leşke riyyêye, ji aliyê Amêrikya û hêzêd impêryalistyêye dîn da hatye kîrêkîrinê û her tiştî bona kara NATO'ê dîke.

Xudanê kitêbê bî hûrgîlî lênhêrandına hukumdarî û bir û baweriyê "xortê tîrk" dide kîvşê, wek sazûmani û idiolojya wusan bû, weki otomanizm gerekê bibûya tîrkizm, ew ji bibûya tûranizm. Lê netewê ne tîrke, ku dikaribûn ser riya pêkanina vê idiolojiya hoviti bibûna hasêgeh, gerekê yan bibûna tîrk, yan ji bihatana kuştinê. Hela hê dema hukumdarya " xortê tîrk" cendirmekî tîrk xûşke ke doxtiryêye ji Danêmarkêra dibêjê, weki tîrkê pêşiyê ermenya

qırkıń, paşê huruma, peyra ji kurda. Rasti ji pey qıra Ermenyaye sala 1915'a salê 1920'i û 1955'a hurım qırqırın, salê 1925'a, sala 1937'a û heta rojê me ji, kurda cişihiti dıkın û qırdıkın.

C.Kirakosyan dînivise, weki "xortê tîrk" kovar û rojnamê xwe-da bona kuştin û talankirina Ermenya kurd tawandar dikirin, lê eger hînek serekeşirê kurda tevi wê qırê bûn ji, ew danina hukumata tîrka bû, ew şertê sazûmâna dewletê bûn. Eva siyaseta serokê Tîrkiyayê gişkane. Raste, Kemal Atatûrk dema hukumat hîlda destê xwe "xortê tîrk" bona qıra ermenya tawandar kîrin, lê payiza sala 1920'i êdi leşkerê komera Tîrkiyayê 200 hezar ermeni li Ermenista na rojhilate kuştin.

Kitêbêda cara yekê derheqa pevgirêdanê Sîltan Hemidê dudu û "xortê tîrk" tevi siyonista tê dayinê. Siyonista bî seroketya Her sel û Vambêri çawa bî dîrav, wusan ji bî kovar û rojnamê xwe alika riya Sîltan Hemid û "xortê tîrk" dikirin, weki bî destê wana Isra yêlê sazkin. Siyonistan gelek mîrov kiribûne nava seroktiya "xortê tîrk". Çawa idolojê wana doktor Nazim, wusan ji, Talat û Cewat cihûd bûn, ji Cihudê bûn, wusan ji Mistefa Kemal Atatûrk, yê siynonistada çawa birayê Vêdûza Loc eyan bû.

Kitêbêda bî roni tê ber çava, weki faşistê sedsalya 20'ye pê şîn ew "xortê tîrk" bûn, wekî faşizm ji tîrka, ji Tîrkiyayê dest pê bûye.

Bî taybeti gava gili derheqa pîrsa natewandaye, ji Sîltan Hemidê dudu destpêkiri heta "xortê tîrk" û diktatorê Komara Tîrkiyayê Atatûrk, heta cûnta iroye hukumdarê xulama NATO' ê siyaseta wane hemberi netewê bîndest qet nehatiye guhastinê, ew faşizm bûye, assimle kîrin bûye û kuştin bûye. Ev seroka gişk zarokê "gurê gewr" amînin.

Xudanê kitêbê guhdarike mezîn dide ser xebata partiyê Ermenyaye siyasi wê demê. Ev şaşı û têberdana wane mezîn wê yekêda dîvine, weki wana pîrsa serxwebûnê danedani. Raste wana bernemê xwe da dînivisi, weki bî şerê çekdari li Ermenistana Rojava azaya siyasi û abori bistinîn, lê şertê Tîrkiyayêda bêyi serxwebûn ew aza yi nîkarîbûn hebûna.

"Ittihadîyara" li hev hat partiyê Ermenyaye netewyê derxe diji hev, weki ewana giraniya hêzê xwe li şerkarya dîji hevdu xercîn, weki nav wanda timê dutireti (dubendi) hebe. Eva ji bû ha-sêga lape mezîn li pêsiya tevgera Ermenya ya netewiye azadaryê.

Bî nîmûna çarenûsa gelê ermeni Con Kirakosyan dide kîvşê, ku diplomatyâ welatê rojavayê pê xûna netewê Tîrkiyayê bîndest tuçarı dikir.

Eva kitêba zanyaryêye giranbihâ bona têgîhiştina siyaseta serokê dewleta Tîrkiyayê kareki baş dide xwendevana.



biranina **KARL MARKS**



Sosyalist, xebatkarên temamiya cihanê, isal bi şayike mezin 165 saliya bûyina, himdarê sosyalizma zanisti, dersdarê proleterya cihanê KARL MARKS piroz kîrin. KARL MARKS, dî 5'e Gulanê sala 1818'anda lî bajarê Trer jî diya xwe bûye. Dî 14 adarê sala 1883' an da çû heqîya xwe. Jî aliyê din, isal pêra gelek cihan temambûna 100 saliya mîrîna KARL MARKS hat biranin.

KARL MARKS, wek hostayê komunizma zanisti, jiyanâ xwe pêşkeşî xweşî û pêştaçûna mîrovaliyê kîr. Wi bi avaki zanisti analiza kapitalizmê, diroka mîrovetiyê û tanga (*istiqamet*) pêşdeçûna mîrovaliyê kîr. Zanyariya MARKS, dî şerê çini da, bû çeka here mezin dî destê proletaryayê da. Fîkrêni wi iro lî çaralî cihanê reh avêtine û jî niha va lî 1/3'ê cihanê, dî bin ronahiya baweriyên wi da jiyanekê nû tê darxîstîn.

Bê şik dî vê rûpelêda, bi çend rêzan mezinaya MARKS û zanyariya wi ya fireh, nayê diyarkîrin. Marks û hevalê wi yê nezik F. ENGELS bi sedan efrandinê hêja, literatureke mezin hiştine. Ya baş ewe em niha guhê xwe bîdine vê hevpeyvina jêrin, ku dî navbera MARKS û keçen wi Laura û Jenny da, derbas dîbe:

- Pîrs: Fazileta here baş, tu jê hez dîki
Bersiv: Sadebûn
Pîrs: Lî ba mîran fazileta here tu jê hez dîki
Bersiv: Xurtbûn
Pîrs: Lî ba jînan fazileta here tu jê hez dîki
Bersiv: Bêhêzbûn
Pîrs: Taybetiya te ya sereke
Bersiv: Beweriya hisk bo armancê
Pîrs: Dilxweşîya te
Bersiv: Şerkîrin
Pîrs: Tiştê ku, tu dikari zûtir bibaxşini
Bersiv: Zû xapin
Pîrs: Xuyê heri nebaş, ku tu jê nefret dîki
Bersiv: Xulami
Pîrs: Tiştê ku, tu qet jê hez naki
Bersiv: Martin Tupper
Pîrs: Karê heri baş ku tu jê hez dîki
Bersiv: Bûyina kurmê kitêban
Pîrs: Helbestvan
Bersiv: Shakespeare, Aeskhilus, Goethe
Pîrs: Niviskar
Bersiv: Diderot
Pîrs: Mîrxas
Bersiv: Spartakus, Kepler
Pîrs: Jîna mîrxas
Bersiv: Gretchen

Pirs: Kulilk
Bersiv: Defne
Pirs: Reng
Bersiv: Sor
Pirs: Nav
Bersiv: Laura, Jenny
Pirs: Xwarin
Bersiv: Masi
Pirs: Tu ji kijan maksimê gelek hezdiki

Bersiv: Tu tişteki mirovi tuneye ku ji bo min xeribe. (*Nihil humanum a me alienum puto*)
Pirs: Gotina ku, tu jê pîr hez diki
Bersiv: Di her tiştî da bîkeve şikê (*De omnibus dubitandum*)



Nigara Jîna Kurd

Nava Efrandinê

Wênekêşen

Ermeniyâ da.

TEMÛRÊ XELİL

Bedewiya here mezin, ku dorberê me, nava me xwe-xwe da heye, ew dostanetiya me ya biratiyêye. Timê nine weki em xurtiya wê dostanetiyê tam texmin dîkin, lê ew wek tavê hergav me germ dike, ronahiya jiyanê dide me.

*Martiros Saryan
Wênekêşen Ermeni*

Dî despêka salên 1920'an da, himê wênekêşî, heykelçêkirin, hunermendi ya grafikê û himê temayêن wênekêşen Ermeni lî Sovyetistanê hatin danin. Ev himdarان, wênekêşen navdar Martiros Saryan û Hakop Kocoyan bûn. Hemâ wan wênekêşa ji di nav wan salan da lî ser jiyina kurdan wêneyêن cihê - cihê kışandîn. Paşı demekê pîr peyketiyêن wan gihiştin, wek Aleksandır Baybeuk Melikyan, Mariyam Aslamazyan, Petros Bayburdyan, Hîrant Hovsepyan û gele kên mayin.

Zargotina kurdaye pîr sedsale, dewlemend, xeyset, erf-edet û deba gelê kurd guhdariya gelek hunermen- dan kışande ser xwe. Ev yeka jî bo wan, bû bîngehê lênihêrandîn û efrandinê. Disa ev yeka nikarîbû jî guhda- riya wênekêşen Ermeni der bîma.

Jî salên sazbûna welatê Sovyet heta niha wênekêşen Ermeni gelek wêneyêن bedew kışandîn lî ser jiyina kurdan, bî taybeti lî ser jînên kurd

Hakob Kocoxanê mezin, sala 1925' an da, wêneyêن 2 jînên kurd kışandî- ye. Rengê cilêن pirekên kurd ne ku hemâ wusan pîr rengin, lê belê reng rînd hev têne hûnandîn. Jî konê kurdayi çarstuni, çiya-bani, ku dûr va xuya dîkin, mîrê kurda bî kulav(apin- ci) şîvantiyê dike, dî wêne da hatîne kışandîn. Jiyina kurdaye koçer ji

xuya dîbe. H.Kocoyan wêne navkiriye "Jînên kurd lî zozana carcimê çê dî- kin".

Dî nav efrandinê, wênekêşen me- zîn Martiros Saryan da, em dîbinin ku wi di sala 1920'an da lî ser jî- nêن kurd 3 lib kışandîne. Navêن wan wênan evin: "Pirekên Kurden Ezdi", "Jîna Kurd", "Dîlegat", Wêna "Pireka Ezdi" di sala 1965 an da, jî ber 85 saliya bûyina wi, di temaşegeha ef- randînê wi da hatiye nişandîn.

Dî sala 1946'an da wênekêşen Erme ni A.Baybeuk-Melikyan wêneke çar jî- nêن kurd kışandîye û wêna xwe nav ki- riye "Jînên Kurd Nava Tebiyeta Batî- ni da" Wênekêş Ara Bêkaryan ji bi na vê "Dota Kurd Cêr dêst da" sûreteki dîn kışandîye. Xêن ji van wênekêşan,



"Çelekdoşa Kurd-Tîrka Efo"

Hrant Hovpêpyan

ev wênekêşen nav lî jêr nîvisandi, dî nav salên cuda-cuda pîr wêne çêkiri- ne, weki :

- Çelekdoşa Kurd- Hîrant Hovsep- yan- 1963
- Rexbeta Kurd -Mariam Aslamaz - yan- 1958
- Ewleda Kurd Çila Silo -Pêetros Bayburdyan
- Xaçatur Abovyan tevi kurda-B. Kolozyan -1948

Heykelçêkirê Ermeniyan, heykelê kurdan ji çêkîrine, mesele heykelçêkir Xorênyan Heykelê zanyarê kurd, etnograf Emine Evdal çêkiriye, ku da

nine ser goristana wi. Ewi heykelçêkiri van dawiya, wusan ji niv-heykelê zanyarê kurdayi bi nav û deng Heciyê Cindi çêkîr.



"Dota Ezdi"
Parûki Têpêlikyan



"Dêmê dota Kurdan-Çila Silo"
Pêtrós Baybûrdsyan

ROMANEKE HÈJA


Ji ber zordesti, lêdan û qedexekirina zimanê Kurdi li Kurdistanê, çawa em dibinin ku, niviskarên Kurd bi hêsayî nikarin efrandinê xwe çap bikin, pêşkeş gel bikin. Lê, disa ji niviskar, helbestvan û zaneyên Kurd, dînîvisin û bi efrandinê hêja va vê zordestiyê protesto dikin.

Ji van niviskarên nûgihiştî yek ji Bavê Nazêye. Romana wi ya bi navê

"Çiyayên Bi Xwin" di sala 1981 li Moskovayê bi zimanê rûsi hat çap kîrin.

Çiye ev xwina li serê çiyayê Kurdistanê dirije? Niviskar di romana xwe da bi firehi bersiva vê pîrsê di de û bingehêna naveroaka romana xwe li ser vê temayê daniye.

Kîlam û Stranen Me



Jî bo berevkîrin, şirovekîrin û danasina zargotina (folklor, efrandinêñ devki) kurdi, Roja Nû, di nav rûpelên xwe da wê ciheki fireh bide van karan. Di vê hejmara pêşin da, em çend stran - kalmân geleri pêşkeşi xwendevanan dîkin. Em bawer dîkin ku, ev stran nan heta niha, ne hatine çap kîrin û weşandîn. Bi taybeti ev stran nan li hêla Diyarbekirê, di govend û dilanan da têñ gotin. Hemû ev stran, ji aliyê heval NAVDAR'da hatine berevkîrin, heval bi xwe niha ji, li Elmania Federal dîmine.

Redaksiyona ROJA NÛ

LÊ BO LÊ

Lê bo lê lê lê bo lê lê lê bo lê
Lê bo lê lê le bo lê sefil bûkê
Xaniyê axê bîçûkê lê lê bo lê
Istûna navay hêlûge sefil bûkê
Jê derket cotek bûkê lê lê bo lê
Derdê min ewa bîçûke sefil bûkê
Lê bo lê lê lê bo lê lê lê bo lê
Lê bo lê lê lê bo lê sefil bûkê
Jê derket cotek qize lê lê bo lê
Derdêm ewa mezine sefil bûkê



XANÊ

Xanê te digo ; ez mîr nakim
Loy loy loy loy xana min
Bisk û keziyan şe nakim
Rabe rûni sebramin

Xanê bexçê pivaze
Loy loy loy loy xana min
Pivaz bûne gîryaz e
Rabe rûnê sebra min

Xanê bexçê incase (1)
Loy loy loy loy xana min
Incas bûne misase
Rabe rûnê sebra min

YEK MÜMIK

Yek mûmîk, du mûmîk sê mûmîk
Çar mûmîk çardeh mûmîk
Serê mûmê misqalek
Bûk li zavê bimbarek
Ha nina ha nina nina nina
Ha nina heyran nina

Kîrasê zavê ho lo
Kîrasê paşê ho lo
Dani li ber me ho lo
Pêşya me dibê ho
Zavayê çav li rê ho

- Kanê zavayê we lo
- Kanê zavaçiyê we
 - Vaye zavayê me lo
 - Vaye zavaçiyê me

- Kanê tîrsîka we lo
- Kanê tîrsîkçiyê we
 - Vaye tîrsîka me lo
 - Vaye tîrsîkçiyê we

Yek mûmîk, du mûmîk, sê mûmîk
Çar mûmîk çardeh mûmîk
Serê mûmê misqalek
Bûk li zavê bimbarek
Ha nina, ha nina, nina nina
Ha nina, heyran nina.

LORİ

Lori lori lori lori
 Canêm heyran malêm gori
 Ew ref-refê çük û mûkan
 Ew xopanê çük û mûkan
 Hêlin çêkir serkê qûçan
 Em wê herne tev Dêrsimê
 Ew mekanê zar û zêçan

 Lori lori lori lori
 Canêm heyran malêm gori
 Ew ref-refê qaz û mazan
 Ew xopanê qaz û mazan
 Hêlin çêkir serkê gazan (2)
 Em wê herne Diyarbekir
 Ew mekanê xal û xwarzan

 Lori lori lori lori
 Canêm heyran malêm gori



XEZALA MIN

Xezala min
 Delala min
 Hay hêli hêli hêli

 Xezala min hêli
 Delala min
 Koçerên beriya jêrin

 Xezala min
 Delala min
 Koçer çûne zozanan

 Xezala min
 Delala min
 Anin barê xiyarar

 Xezala min
 Delala min
 Pezê bavê te sor

 Xezala min
 Delala min
 Beriyê da ore ore

 Xezala min
 Delala min
 Pezê bavê te reşe

 Xezala min
 Delala min
 Beriyê da dimeşe

GULE

Ax lê gulê gulê gulê
 Lê gulê ax lê gul
 Ax lê gulê gulê gulê
 Şirinê vîrda were

 Ez û gula xwe çûne çiya
 Gulam topkîr gul û giya
 Şirinê vîrda were

 Min go; gulê eva çiya
 Lê gulê ax lê gul
 Gula min go; derdê dile
 Şirinê vîrda were



KIN IM

Kînim kînim kînim
 Kînkê canê heyran
 Kînim dîrêj nabîm
 Kînkê canê heyran
 Zêrim xîrab nabîm
 Kînkê canê heyran
 Entax e Entax e (3)

 Kînkê canê heyran
 Şewîti tax bî tax e
 Kînkê canê heyran
 Dergûş e dergûş e
 Kînkê canê heyran
 Şewîti qevdek pûş e (4)
 Kînkê canê heyran

ZIRAVÊ

Zîrav zîrav zîravê
 Leylo leylo zîravê
 Zîrav qîza keşê ye
 Leylo leylo zîravê
 Rîndê qîza keşê ye
 Ax keçê zalîm bavê
 Zîrav çûye qîrşikan
 Leylo leylo zîravê
 Rîndê çûye qîrşikan
 Ax keçê zalîm bavê
 Şîrpa şîrpa şîmikan
 Leylo leylo zîravê
 Şîrpa şîrpa şîmikan
 Ax keçê zalîm bavê
 Zîrav dendik dîgeline
 Leylo leylo zîravê
 Paya xortan hiltine
 Leylo leylo zîravê
 Paya keçan direje
 Ax keçê zalîm bavê

 (1) incas: Qeysiya reş
 (2) gazan: Serê çiyan
 (3) Entax: Navê hêlekê
 (4) Qevdek: Baq



KURDZAN Ú ZIMANZANÊ JEHATI:

Prof.

ÇERKEZ BAKAEV

Roja Nû, niviskar, ronakbir û hunervanên ku xwendevanên me ra
nenasin, wê hejmar-hejmar bide naskırın. Dî vê hejmarê da, emê zi-
manzan û filologê jêhati -Profesor ÇERKEZ BAKAEF bîdîn naskırın,
ew bi xwe niha li Moskovayê kar dike. Nîvisar, ji aliyê heval
ROHAT'da hatiye amadekîrin.

Redaksiyona ROJA NÛ

Mirov iro navê 2 zimanzanên Kurd li Sovyetistanê bide, yek ji
wana Qanadê Kurdo û yek ji navê Çerkez Bakaev. Navê Bakaev, bî
rasti Çerkeze Xodu Bakaev. Lî, bî kurti navê wi tê zanin, wek Çer-
kez Bakaev. Ev zimanzan û Kurdzanê jêhati iro li Moskovayê dimine
û dî Akademiya sovyetistanêye Zanistan da, nav beşa zimanziyê
da dixebite.

Çerkez Bakaev zaroktiya xwe, dî nav belengazi, xîzani û zelu-
like mezîn da derbaz kîr. Paşê wi dî nav baskên sosyalizmêye germ
da xwera starek dit û kete etimxana bajarê Aştarakê. Ev etimxana
dî sala 1920'an da li Ermenistanê vebû û dî têda pîr zarokê kurd
cih girtin. Dî wan salan da ji, dî vê etimxanê da zarokê kurd
dest bî hinbûna zimanê kurdi kîrin, yek ji vana Çerkez Bakaev bû.

Çerkez Bakaev paşê xwendîna xwe pêşta bir û kete Üniversitê.
Vi lawê kurd paşê karêñ xwe li ser zimanê kurdi pêşte bir û bû
doktorê zanistiya filologiyê. Ew wusan ji, li ber destê Kurdzanê
mezîn İ.A. Orbeli mezîn bû û xwe gihand.

Paşî gelek salan Çerkez Bakaev pîr vekolin-izgeriyêñ zanisti
pêk ani û li ser van xebatan pîr pirtukêñ wi hatîn çapkîrin. Ev
zimanzanê jir û jêhati niha ji xebatêñ xwe li paytextê Sovyetista-
nê, Moskovayê dajo.


Cara pêsin, dî sala 1957'an da Çerkez Bakaev ferhengeke pîr
hêja û gîranbiha li Moskovayê çap kîr (1). Dî vê ferhenga Kurdi-
Rusi da, nêzkaya 14 hezar peyvok (gotin, kelime) cih girtin. Mi-
rov dikare bêje ev ferhenga bî jêhati hatibû amadekîrin, ji ber
ku, dî ferhengê da pîr tiştêñ gîramatikê ji hebûn. Bi rasti ev
ferhenga hêja ji, ferhengeke modern bû. Pêşgotina vê ferhengê Prof
i.A. Orbeli nîvisi û derketîna vê efrandinê va, ew pîr kîfxweş bû
ye.

Ev kara ji bo Çerkez Bakaev tenê despêk bû. Wi karêñ xwe ne-
dan sekinandin, dî nav salan da, wi gelek pîrtûkêñ dîn amadekîr û
çap kîr. Vir şunda Bakaev destpêkir li ser diyalek-zaravêñ zimanê
Kurdi li Cumhuriyetêñ Sovyet serê xwe êşand û bî vi kari va mijûl
bû. Ji bo van karan ev gelek salan dî nav kurdan da geriyaye û ge-
lek tişt ji ber devê wan berev kiriye.

Dı sala 1950'an da Çerkez Bakaev xebata endamê doktoriyê amede dîke, navê xebata wi "Rola paşpirtikan, dı şirovekîrîna peywendiyên gramatika zimanê Kurdi" (2). Paşı vê xebata xwe Bakaev lı ser kurdiya kurdêñ Turkmenistanê kar dîke û bı navê "Diyalekt Kurdêñ Turkmenistanê" dı sala 1962'an da lêgerineke zanisti dînivise (3). Çawa em dibinin, ew tu wext vala nemaye, sal bı sal xebatêñ xwe bı sistematik ajotkiye. Bakaev, vê carê ji lı ser Diyalekta Kurdêñ Azarbeycanê pırtukeke çap dîke. (4)

Dema mîrov cav lı xebatêñ Çerkez Bakaev dîgerine, mîrov tîşteki dîbîne, bı taybeti hemû karê wi lı ser diyalekêñ (zarav) zimanê Kurdi berev bûne. Cudati û nêzikbûna van diyalekan dı nav xwe da çawa pêsta çûne, çawa guhirine, ev pîrsa, pîrseke sereke û bîngehine dı nav karêñ wi da.

Çerkez Bakaev dı sala 1977'an da hemû van karêñ xwe bı teorik berev dîke û pîrtûka xwe ya dawin dînivise. Ev pîrtûka bı navê "Dı warê pêştaçûyina zimanê kurdêñ Sovyetê da, rola kontaktêñ zimanan" (5). Zimanê Kurdi bı zimanê ûrisi, ermeni, erekbi, û bı zimanê tîrki va hemberi hev dîke û tesira wan lı ser hev nişan dîde. Bı rasti dı warê etimologiya zimanê kurdi da, ev xebata pîr pîrsan zelal dîke.



Ji der van karan, zimanjan û kurdzanê xebathîz pîr bendan û lêgerinêñ dirêj ji, dı nav rojneme û kovaran da nivisi, wek "Diroka Hinbûna zimanê kurdi lı Ûrisetê -lı Sovyetistanê". (6)

Profesör Çerkez Bakaev, dı nav kar-barêñ xwe da zîravi û tenîkiyêñ gramatika zimanê kurdi baş ji hev deraniye, wi dı dawiyê da

bîngehêñ zimanê kurdi vekolandiye û xwe gîhandiye kuraya zimanê kurdi. Bi baweriya me, ji vi kari hêjatır tu karek tuneye û Çer-kez Bakaev dikare xwe dîlşä bîhesibine.

- 1- *Kurdsko-Russkiy Slovar- 1957, Moskova*
- 2- *Posledogi Kak Sredstva virajeniya gramatiçeskiy otnošeniy v kurdskom yazïka -1950- Leningrad*
- 3- *Govor Kurdov Turkmeni -1952- Moskova*
- 4- *Yazïk Azerbeycanskïy yazïk -1965- Moskova*
- 5- *Rola yazïkovix kontoktov v razvitiye yazïka kurдов SSSR-1977- Moskova*
- 6- *Istoriya izucheniiye kurdskova yazïka v Rosiya i SSSR -1962- Moskova.*

* *


ÇEND KASETÊN NÛ

Federasyona Komelê Karkerê Kur-
distan li Elmanya Federal (KOMKAR)
di nav karen çandi da, despêkir rêze
ke bandê (şerit, kaset) kurdi der-
xist. Di nav vê rezê da, bandên van
dengbêjên jêrin heta niha derketin,

- Banda Aramê Tigran
- " Feqiyê Teyran (1,2)
- " Şêxo
- " Bêrti
- Dengê Kurdên Sovyetistanê
(Band1,2,3,4,5,6,)

Ji aliyê din bandeke def-zurnê
bi gelek meqamên kurdi va, hevra hat
tijikirin.

Aramê Tigran, bi salan zarotiya
xwe, xortaniya xwe di nav kurdan da
derbaz kiriye û zimanê Kurdi baş fêr
bûye. Kal-bavêñ Aramê Tigran Ermeni-
ne, lê ew, wek dengbêjeki Kurd tê za-
nin û baş Kurdi dîpeyve. Li Kurdistâ-
nê navê Aram, di nav gel da pîr be-
lav bûye, dema kompazitorê Ermeni A-
ram Xaçaturyan beri çend sala çû reh
metiyê, wê demê, gel pîr berxwe ket,
weki Aramê Tigran çûye ser heqiye
xwe, lê wusan derneket. Aramê Tigran
beri çend sala rîket, ji Suriyê hate
derkete Ermenistana Sovyet û niha ji
li wir dîmine. Heta niha li Ewrûpayê
pîr bandên Aram, bi stranêñ xweşik
va derketin, beri çend meha, bânda
wiyê dawin, ji aliyê KOMKAR' ê, hate
derxistin. Di nav vê bandê da, ji hev
xwëstir gelek klam-stranan ci girti-
ne.



Aramê Tigran
di şahikê da tê xuyan

Çi dı vi dengi da heye ?

-Wextê Türk ji Asiya Navin, berbi rojavayê hatine, ji çiyayê Tibetê he-ta Anatoliyê heta Rûsyayê her der vîk û vala bûye. Mesela dema tîrk hatine Kurdistanê ji, kes lî vi welati tune-bûye. Hetani wê rojê, piyê merivan bî wan erdan neketiye. Nebêjin;"Çawa kes tunebûye, ma dirok derewan dike?". Erê, eger tu ji alimên Türk, ji dirokvanêن wan, ji serdestêن wan bîpîrsi, hemû ji wê ji te ra ispat bîkin ku heta ew nehatine, kes tunebûye lî wan deran. Ji xwe bî navê Kurd hêç gelek tunebû



ye lî rûyê erdê. Cara pêşin wextê ku êl û eşirêن Türk hatine Kurdistanê , lî wir zivistan bûye. Dema ku lî ser berfê çûne, berfa kursegirti di binê piyêن wan da "kirt! kirt! kirt!" deng derxistiye. Wan camêran ji heta wê rojê dengeki waha xweş nebihistîne . Ji ber ku kêfa wan gelek bî vi dengi ra hatiye, navê êleke xwe danine Kirt. Paşê bûye Kürt. Û niha ji em ji wan ra dibêjin Kurd..... Ma ci di vê dok tîrinê da, di vê şirovekîrîna zanîsti da heye?

- Ha ! Tê bêji dirok , nîvisarêن kevn , bermayêن kevnare usa nabêjin .

Lê, diyare ku ew gişt lî diji Tîriyê hatine nîvisandin. Wan ew tişt nîvisandin ku , Türk hertîm hevriki hev bin, ji hev parce bin. Ev êla Türk ku vexteki çend hezar bûn, iro bûne bist milyonan. Bûne bela serê Tîriyê. Ji xwera zimanek ji çêkîrine, ji dused keliman pêktê. Ew ji disa zima nê tîriyê, lê tîrk fehm nakin... Ew kambaxa dengê "kirt"ji usa nexweş e, iro dema ku bûrjuvaziya monopol, alimên wan, generalên wan dibihisin wek ku cînêن wan lî serê wan komdibin. Kê fa wan direve. Dînya lî wan tarîdîbe. Dujmînêن dereke ji, yêndî hundur ji tim dixwazîn lî Tîriyê berf hebe û ew deng jê bê....

- Te go erê? İcar ev "kirte-kirta" han, iro bûye derdeki bê derman, nexweşike bê hempa, lî Tîriyê peyda bûye. Nexweşike usa ye ku, ji dewletan derbasi dewletan dibe. İran û Iraq ji bi vê nexweşiyê ketîne. Bombe yênapalm, tang û tifingêن wan ji nikarin vê nexweşiyê qenc bîkin. Sêsed hezar leşkerêن Tîriyê, bi hemû barbari û gengaziyêن xwe va Kurdistan dagîrandine. Gund gund, bajar bajar pêgermokê dîgerinin. Radiyo, tv û hemû navgînêن wan, dixebîtin ku, vi dengi vemîrinin. Kuştîn, zindan, êşkence ji feyde nake.

.....

- Tu dizani di vi dengi da ci heye? Ev dengê han ji ci pêktê?

.....

- Ez ji te ra bêjîm:

Dî nav vi dengida ,gelek elementen cîvaki ,çini û netewi hene. Doza ja jehra wan pîr bîlinde. Mesela jehra koletiyê, azadîvon ,anti - faşyon, anti-emperiyaliyon, anti-kolonyon û hwd. ji van elementan xeteretir tiştîk tûneye!

.....

- Emriqa ji bi hemû teknoloji û gengaziyêن xwe va, nikare çareki ji van

ra bîbine.Tîrkiyê ji Emeriqayê pîr a-likari girt û dîgre.Gelek aqîlbend , doxtor,profesor,ajan û personalên jê-hati,ji nexweşxana CIA'ê û Pentagon'ê têne tedaviyê. Emeliyat lî ser emeliyatê feyde nade.Kuştin ,êşkence wek dermanê tevízandinê bikartinin.Lê,nexweşi ji ortê nayê rakîrin. Roj bî roj zêdetir dibe.Lî çarali cihanê nexweşî yên drûvdayi hene.Ma Vietnam nayê bîrate? Emerqa pîr xwe êşand,bê hêjmar mes ref kîr,ji gelê Vietnam gelek qurban stend,pîr cedand,heta masiyêñ deryan ji lî diji Vietnamese bikarani. Lê Vietnam,disa ji bû birineke bê hempa! kelemekei tûj dî çavêñ van da ava bû.
-bi gotinêñ gotinvanan,tenê çarek
heye lî diji van nexweşyan.

-????

Erê,tenê çarek heye:Tunekırına ci hanê! İro cihan ,ji bo wan bûye wek cendegeki nexweşiyê.Rojê lî ciheki wê nexweşik çêdîbe.Duh,Kuba bû , Vietnam bû,Angola bû,iro ji Salvadore,Kurdistanê ,sîbê jiNa, na tenê çareke wan heye :Cihanê ji ortê rakin. Weki din tu rê tuneye.Eger bikarîbin...

Dibe ku nexweşiya "Kurd"ji wê çaxê bî hemû nexweşiyêñ dinê va tevayı ji ortê rabe.İcar lî dînyake din,eger di sa Türk ji cihêñ xwe rabûn çûne cihêñ din dîvê towbe bikin,çareke din dengê kurşê (berfa qerisi),wek nav lî xwe nekin.

.....



FERHENGA KURDİ - RÜSİ

îsal li Leningradê ferhengeke pîr hêja, bî rûsi-kurdi (zaravê soranî) hat çapkırın. Dî ferhengê da nêz kaya 25 hezar peyvok (gotin, kelime) hene. Ev ferhenga, kareki nûye ku, cara pêşin bî rûsi û bî zaravê soranî ferhengek derdikeve. Ferheng jî a liyê Qanadê Kurdo û Zera Üsif da hatiye amadekirin, ev efrandîna giranbihâ 752 rûpeli va pêk hatiye. Li jêr, em li ser vê ferhengê nîvisareke bî zaravê soranî çap dîkin. Nîvisar jî aliyê Dr.C.Heyderi da amadebû ye.

Redaksiyona Roja Nû

АКАДЕМИЯ НАУК СССР
ИНСТИТУТ ВОСТОКОВЕДЕНИЯ

К. К. КУРДОЕВ,
З. А. ЮСУПОВА

КУРДСКО- РУССКИЙ СЛОВАРЬ (СОРАНИ)

Около 25 000 слов

МОСКВА
«РУССКИЙ ЯЗЫК»
1983

Eger mêtûy kurdnasi le Rûsyada bigerêtewe sedey nozdehem, lew katey ke Peter Lîrx kitêbeki le sê çizimda çap kird, derbarey ziman û itnografi geli Kurd. A lew rojewe ta êsta, xizmetêki zor kîrawe derbarey lêkolênewe û nusini mêtûy û kulturi gelê Kurd.

Eger ci kurdnasi diwa bediway Şorişi Okitoberi Sosyalisi bari goreweb Be taybeti diway ewey çenid zanayêki Soviet, gîrngan da be tojinewey Kurd, herçende besêki zor kem le geli Kurd le Soviet deji. Be pêşniyari em zanayena bo yekem car, jîmareyk le kurdnasani Soviet le sali 1934 yekem konigireyan basit le Yerivan. Emeş biwe binexe bo diwa roji kurdeloci êsta. Ta sali 1959 ke be resmi, le Amojigay Leningrad bei Kurdi kîrayewe, be beşdari profisor Qanati Kurdo "Kurdoiv" ke le sali 1960 serperşti em beşey wergirtwe. Le mawey em bist saley diwayi bei Kurdi le Leningrad karêki zori kirdi we le pênaw bojandinewey mirat û mêtûy, edebi û zimanî kurdîva. Hev wek aşikiraye ke çapkirdni Mem û Zin, Şerefname, çenden kitêbi tir be zimanî rûsi ber hemi ewena, cîgelewey amede kirdni deha lêkolênewe derbarey ziman û mêtûy Kurd çapkirdni giramatiki Kurdi û ferhengi Kurdi - Rusi le salani çûda. Em beşe jîmareyik kurdnasi le Irak amede kird le jêr çaw dêri Prof. Kurdoev. Estaş diway dehe sal xo mandu kirdin le diway wişê geran.

Prof. Kurdo û diktore zarê diyaryêki qışengyan pêşkes. Xwêndewari Kurd kirdiwe. Ferheni Kurdi-Rûsi e, be zarawi soranî. Bêguman nûserani ferheng sudyan le le Kurdani hendevan biniwe her wek xoyan le pêşekida basi deken. (lapere 14)

Nuseran ferhengekeyan bem core pêşkeş xwêner deken.

Eme yekem ferhengi Kurdi-Rusi qe le wilati ême û henderan, ke le lêksiki zarawi sorani dandrabit. Em ferhenge nêzikey 25 hezar wişey zîmani edebi Kurdi têda tomor kîrawe, qewarey firewani ferheng lewedaye, ke hemû core lêksiki girtotewe le huneri û zanyari û ramyari û komelayeti. (lapere 13)

Hiç gumanî têda niye ke, em ferhenge, karêki gelek be nîrxû bê hewtaye le mûjûy ferhengi Kurdida, lapareyêki niwê tomar dekat le xebati zanayani Kurd le wilati Sovietda. Ferhengeke zor sud bexşe bo hemû kurdêk, le taybeti bo eweney zîmani Rusi dexwênen. Le heman katis da, yarmetiderêki zav başe bo Kurdani Soviet, le rîgây em ferhenge nasyawi peyda deken le gel zarawi sorani û ferhengi zrawekeyan dewlemend deken le wişey reseni zîmani adebiman.

Be ray min, pêwist bo nawi ferheng neben bo Kurdi sorani, beliku her binüsün. Kurdi xwariya bakûr, le katei xwêyde her em rayem nûsiwe le nameyek bo dezgay çapemani-zîmani Rusi-mîniş lew birwâyem wek nuseran le pêekida denüsün yekem kari zanyari wa gewre bê kemû kurti nebit.

Nuseran denüsün : " Renge em ferhenge bem corey êsta û weka ye kemin taqi kirdinewe bê kem û kuri nebêt, belam seretay e binaxdang karêki zanyari gewreye û pratikyen le ber dem Kurdnasanda û rîgayan le xoş dekat." (lapere 14)

Be ray min kema kuri ferheng lem sê xalade kodebinewe:

1 - Heley çapi, eweş degerêtewe ser nazanini kîrêkarani çap zîmani Kurdi û kem terxemi le berawird karida.

2 - Tomar dîrdini jimareyk le wişey bêgane, bê ewey dest nişan bikrên ke kurdinin. Be Kurdi le qelem dirawîn le ferhengda.

3 - Le her tipêkde, jimareyk wişey dest kar heye ke naçne hêw zarawi sorani her çende le ser binaxey rîzmani Kurdi da taşrawîn.

Bê guman em karey Prf. Kurdo û diktore zarê Cêgay Şanazi hemu geli kurde û şwêni taybeti heye le mêmûy ferhengi kurdida û kurdnasani Sovieta. Nusaranîşi cêgay rîzu şanazin.

Dr. C. Heyderi

31.05.83 Stockholm

Ser Bûyina NAZIM HİKMET ra

80 Sal Derbaz Bûn


Isal pêra lî ser bûyina helbestvanê Türk Nazım Hikmet ra 81 sal der baz bûn, çawa tê zanin helbestvanê nav û deng di sala 1902'an da hat dînyayê û di sala 1963'an da çû ser heqiyâ xwe, tîrba wi niha ji lî bajê Moskove.

Jî ber tijikirîna 81 saliya xwe, Nazım Hikmet lî gelek welatan bî pêk anina pîr civin û şahîyan va hat pîrozkîrin. Dî hemû van karan da, lî ser meznaya Nazım, hunermendiya wi û dînênsiya wi hat seknandin, jî helbesten wi gelek beş (keri)hatin xwen din.

Jî van Şahiyan yek ji, dî roja 13.2.1983'an da lî bajarê Stockholmê pêk hat. Vê şahîyê bî baweriya "AŞITI, PIŞTGİRTİ Ü BIRATI" yê va destpê kîr û lî ser helbestvanê Türk Nazım Hikmet û ser helbestvanê Yuwnan Yannis Ritsos gotar û helbest hatin xwen din. Şev bî xwe bî navê van herdu, helbestvanêne mezîn hatîbû amadekirin Çawa tê zanin, helbestvan Yannis Ritsos ji, wek Nazım Hikmet gelek salan dî girtigehê da maye, dîji faşizmê stûyê xwe xar nekiriye. Wi lî ser a-zadiyê, gelek helbesten bî şewat û xweşik nîvisiye.

Wek desten diya min
dilketiya min
wek desten jiyinê.
Birayê min
bî xwe ji, we
tu wext ez tenê ne hiştîm.
We ez tenê bernedam
ne welatê min
ne ji, milletê min.
Hûn, me û yêñ me, hez dikin
ez zanîm.
Çawa ez, we û yêñ we hez dikim.
Jî ber vê yekê
Jî we ra zor spas
we spas dikim birano.
Birano,
ez naxwazim bîmrîm.
Lê, min bikujin
disa, ezê lî ber serê we
bîminim û bajom jiyina xwe.

.....
.....



ZANİNGEHA KURDİ

Lı Parisê Vebû

Dı meha Sibatê da, lı paytextê Fransa Parisê, bı pêşengiya hin dirozan, niviskar û ronakbirên Kurd, instituyeke Kurdi vebû. Lı pişt damezrandina vê instituyê, wezirê çandi yê Fransê ji hebû. Bi vebûna instituyê, şabûneke mezin dı nav Kurda da peyda bû.

Endamên instituyê, belavokek derxistin. Dı vê belavokê da armancêni instituyê têni diyarkırın û lı hemû welathîzên Kurd bang tê kırın, weki ew piştgiriya instituyê bikin. Xebatêni lı pêşiya instituyê bi kurti, van çar warêna handa wê bête meşandin:

- Xebat ji bo nêzikbûna zaravên Kurdi (Kurmanci, Sorani û Zazaki)

- Çapkırına ferhengên Kurmanci - Kurmanci û Kurmanci - zimanê biyani.

- Çapkırına pirtükên Kurdi yêni e debi û diroki, ji bo zarokên Kurda.

- Çapkırına pirtükên helbestvanen Kurd û derxistina kovareke çandi.

Beriya damezrandina instituyê şeveke çandi hate çêkirin. Dı şevê da mamostayê mezin Cigerxwin axiftinek çêkir. Rejisörê Kurd Yılmaz GÜNEY, hozan Şivan, koma folklorâ KOMKAR, koma ZOZAN û gelek sinetkarêni bi nav û deng besar bûn.

Xebatêni ku instituyê daye pêşiya xwe, xebatêni pîr hêja û gîringin. Pê êwiste, hemû Kurdêni welatparêz, lı dervayı welat, xebatêni ji bo çanda gelê me, piçûk nebinin, bi çaveki mezin lê binhîrin û pişgirtiyê bikin. Bi vebûna instituyê, dijmin gelek a-ciz bû. Lî gelê Kurd pê şabû. Em ser firaziya wê dixwazin.

INSTITUT KURDE DE PARIS



ROJNAMA

«Kurdistan»

22 APRIL 1898

Ez ji hezar tanki û ji hezar iez
keri natırsım, lê gotareke rojnamekê
min ditırsine.

WABLYN BONEBERT

Diroka her kovar û rojnamên ge-leki, bî xurtî, bî tehreki diyalekti bî diroka wi gelî va hatiye gîrêdan. Rewşa gel, bandura xwe yekser lî ser derçûna, pêşketîna kovar û rojnamân nişan dide. Di tevgera rîzgari û aza-diya gelê kurd da, mîrov dikare bî hêsanî bêje, weki kovar û rojnamên kurdi roleke mezîn dîlizîn û nîkarîn ji vê tevgerê cuda bibin.

Rojnama "Kurdistan" ji bî jiyina
gelê kurd va hatiye gîrêdan û bî pey
dabûna gîyanê (ruhê) welatpareziyê
di nav kurdan, çawa tê zanin dî des-
pêka sedsaliya 20'an da yekten bî-
lind û tuj bû. Rojnema "Kurdistan" di
demeke wusan da der çû. Ev rojnema
22 meha Aprilê, dî sala 1898 li pay-
textê Mîsirê, Kahirê hat çap kîrin.
Xudaqên rojnemê Mithad Beg û Ebdel
Rehman Beg bûn.

Kurdistan hertim lî ciheki der nediket, ji ber sedemên taybeti û gîring cihê çapkırına wê dihate guhar-tin, hejmarêñ 1-5 Kahire, 6-19 Cine-vê, 20-23 careke din lî Kahirê, 24 lî London, 25-29 lî Folkstonê, 30-31 careke din lî Cinevê hatin wegandin.

Rojnama Kurdistan, rojnema yekemine di diroka kovar û rojnemeyêndurdi da.

Ji ber vê yekê kurdzan(kurdolog)
Dr.Meruf Xeznedar, di rojnema "Al-
Xeaxî" da lî ser derçûna rojnema Kur
distan gotarek nivisi û têda diyar
dike ku: "Roja 22'ê Aprilê pêviste
bibe cejneke rasti, ji rojneme û ko-
varêñ kurdi ra".

Dr. Mistefa Resol di pirtuka xwe,

ya bî "Lî ser rojneme û kovarên Kurdi" dî sala 1973'an da dînivise: "Ev rojneme bî zimanê kurmanciya bakur (zaravê hêla Botanê) hatiye çap kîrin. Rojneme bî çar rûpelen û dû hefta çarekê derketiyê. Tipên wê bî erebi û şêweyeki farisi bû, jî hejma



ra sisîyan da gotarêñ bî zimanê tîr-
ki ji têda hatin wesanîn..."

Girîngiya vê rojnemê nebes, rojnema kurdîye yekemine. Ew rojnemeke rêzani û diroki bû. Rojneme ji ber hêsanîya nîvisandina bir-bawerîyan û analizan hatîbû naskîrin.

Dı hejmara yekemin da Mithat Beg
bı her awayi berxwe daye û bangı (gazi)
gelê kurd kiriye ku, zarokên xwe



Firnado wê rabe ser piyan

N.AZAD

Derinin destmalên xwe heriri
 Bihêlin kîncên xwe heznîtiyê
 Nestirêñ kîlamân şina
 Ji rojê dilopek çik qetya
 Deştêñ Guatemalayê şe dîke
 Digere qunc bî qunc
 Dikele Meksika, keskên havinê
 li xwe dikin
 Deştêñ El-Salvador û kulilkên sor
 Binê belav dikin
 Çal -kort azad dibin, rê azad dibin
 Binhêr, ji nû va tê dinê Nikaragua
 Nexeyidi dayê, ji bir dikim qet
 Te û welatê te
 Binhêr, min xeberên xwerê
 gihadîn hev
 Dipêçin destêñ birindar
 Nava Emerikê zirav
 Binhêr, li paş turê tije ax
 Tîvinga Fernando kîlama distirê
 Gabriel billurê lêdixe

Rûniştîye li ser çoka Ernesto
 Tariyê dîqelêşe
 Ji wan ji hız bike bî çend min
 Binhêr, di tîlya fernando da,
 gustil heye
 Binhêr, di mabêyna mirin
 û Gabriel da çi heye
 Ziqaq birindarin, rê birindarin,
 xani birindarin
 Tîving tiji gulle ne
 Mirov li pê, eniya xwe dane dijmîn
 kilama distirê
 Ji welatê xwe çigas hîzdîkin
 ev Latin Emerikê
 Mina me xwina wan ji sor e
 Dijmînê wan ji pîr nêzike
 Xençerên xwe tuj kîrine
 Xîlçi xwinê dikin
 Lê belê, ew yarı kuştînê ninin
 Ku, welatê wan ji wan ra bîhêlin
 Firnado wê rabe ser piya
 Mina Gabriel pîfi billurê bike.

Xelatêن Aşitiya Cihanê Bî Navê LENİN


Dî warê "Jî bo xurtkîrîna aşîtiyê navbera milletan da" xelatên bî navê LENİN, vê carê jî ber kar-xebatêñ xwe, jî van kesen jêrin ra hat dayinê:

- John Morgan, Keşîş - Kanada
- Liber Seregeni, Siyasetvan - Uruguay
- Mikis Teodorakis - Dengbêj, kompozitor - Yunanistan
- Mahmut Derwiş, Helbestvan - Felestin.

Ev xelatana çawa tê zanin, çend sala carê tê dayinê, xelatên aşîtiyê bî navê LENİN, vê carê, jî bo salên


1980-1982 hatin diyarkirin. Dî navçar kesen da çawa tê zanin, Mahmut Derwiş li ser Kurdan helbesteki pîr xwes nîvisiye, dî keriki vi helbestida, tê gotin ku:

*Milletê min
Namert êrişi diroka mirovtayê dîkîn
Bî navê Erebtîyê qetîl helal bûye
Çarixêñ piyê te, li ser te
zordestiyê dajon
Tu avitine nav gemara çaxi
Heyfe ku dem jî demê
nayê vegatandin
Bî navê Erebtîyê êrişê dibine
ser çemêni DICLE-FIRAT*



Hejmara Diwanên CİGERXWIN

Gihişte Heftan



DİWANEKE NÜ

HÊVİ

Diwana helbestvanê mezin- Cigerxwin ya bî navê "HEVÎ" dî nav weşanên 'ROJA NÜ' der çû. Ev diwana Cigerxwin ya heftemin û ya dawiye. Bî vi tehri hejmara diwanê mameste gihişte 7'an. Bî rasti ev efrandinê hêja, jî bo çand, hunermendi û jî bo edebiyata Kurdi bû definekê. Diwanê Cigerxwin dî nav gelek salan da, jî destê kurdan neketin û dî nav Kurdan da belav bûn. Çawa lî jêr ji xuya dibe ku, piraniya diwanê Cigerxwin, paşi hatına wiye Swêdê, lî Stockholmê hatin çapkırın:

- 1) - DİWANA YEKAN, 1945 - ŞAM
- 2) - SEWRA AZADÎ, 1954 - ŞAM
- 3) - KİME EZ, 1973 - BEYRUT
- 4) - RONAK, 1980 - STOCKHOLM
- 5) - ZEND-AVISTA, 1981 - STOCKHOLM
- 6) - ŞEFAQ, 1982 - STOCKHOLM
- 7) - HEVÎ, 1983 - STOCKHOLM

Diwana dawin "HÊVÎ" bî 200 rûpe- li pêk hatiye û têda jî hev xweştir pîr helbestan ci girtiye. Jî bo vê diwanê folklorist û zaneyê jêhati Ordixanê Celil ji pêşgotinek nivisiye. Dî keriki (beş) pêşgotina xwe da Ordixanê Celil dibêje ku: "Têma wellêt, têma Kurd ûKurdistanê, têma şorışê, serxwebûna gelê me, pîrsa xwen din û pêşketinê, neyariyê û bêbextiya dîjminê gel (dîjminê der û hundır), pîrsa dostiya û biratiya hemû gelên cinar û têma internasionalizmê Cigerxwin her dem dike binyata helbesten xwe. Eve meznaya Cigerxwin û bir-baweriyê wi".

Dî nav 80 salen xwe da Cigerxwin hertim nivisi û jî bo azadi, pêşketin û serfîraziya gelê Kurd tu wext vala nema. Dî warê bîlinbûna agirê a zadiyê, dî nav Kurdan da, Cigerxwin roleke pîr mezin list û keda wi, dî vê rê da pîr derbaz bû. Ev niha ji dînivise û agirê şoreşê gur dike.

CİGERXWIN

HÊVİ

DİWANA 7'A



Ditemek ji Filma RÊ (YOL)

Di nav salekê da 2 filmên li ser Kurdistanê li Ewrûpayê 5 xelat girtin. Ev herdu film li hemû cihanê li pêsiya bi milyonan mîrov hatin ni şandin. Bi vi tehri, bi listina filman va, Kurdistan û bi milyonan mîrov hatin hemberi hev. Ev herdu filmên hêja, li ser rewşa Kurdistana Tirkîyê hat kişandîn.


Filmê pêşin 'RÊ' (YOL) li Cannesê, di cejna filman da xelata yeke-min girt. Bi girtina xelata zêrin va filmê 'RÊ' bal û guhdariya hemû ciha-nê carke din kîşande li ser Kurdistanê. Bi rasti dema mîrov li film mîze dîke, hêjabûna film xwe diyar dibe û mîrova di bin tesirêke mezin da dihê-le. Rejisörê vi filmê giranbiha Yilmaz Guney çawa tê zanin, li ser rewşa gelê Kurd geleb filmên din ji, li Tirkîyê kişand û wan ji pîr xelat stend.

Filmê din "Li Çolemergê Demsalek" (Hakkaride Bir Mevsim), di şê nahiya filman da, li Berlinê 4 xelat li ser hev girtin. Film li Kurdistanê li ser rewşa mamosteki hatiye kîşandin. Di rolê sereke da Genco Erkal dilize. Dijwariyê navbera ronak biran û gel bi firehi naveroka film pêk tine. Filmê bi navê "Li Çolemergê Demsalek" xêni ji xelata duwemin, ev xelatên jêrin ji girtin:

- Xelata Rexnevanê Sinnemayê li Cihanê

- Xelata Dêra (klise) Protestan
- Xelata nîviskarê hunermendiya sinemayê li cihanê

Bi alikariya van herdu filman, pîr kes li cihanê, li ser çand, kev-neşopi û folklora Kurdan agahdar bûn, nasiya xwe dane deba gelê Kurd. Bi taybeti filmê 'RÊ' li dîji zordestiyê li ser gelê Kurd protestoke politik va tîjiye û bi hiski hêzên kolonyalist li Kurdistanê pîrotesto dike.



Sigabend



YAR GOVENDÊ

Allegretto

Yar go - ven - dê lê. yar go - ven - dê.
 Ez h'ey - ra - na lê, ba zi - nê zen - dê.

Yar govendê lê, yar govendê,¹⁾
 Ez h'eyrana lê, bazine zendê.
 K'erba t'eva hatime bendê.
 Govend geñya lê, xet ber xete.
 Sergovendî lê, qîz û met'e.
 Govend geñya lê, sûk ber sûke,
 Sergovendî lê, qîz û bûke,
 Yar govendê lê, yar govendê.